

**Dumahîk : Şoreşa ...**

sedemên sereke, wek :

- Hêza rijîmê ya aborî û leşkerî, kêma zêde li cî ye, di siha piştgiriya xurt ya hin dewlet û rêxistinên jê re, û kiryarên wê yên hovane.

- Beşek mezin ji civaka Sûrî û bi taybetî ji hindikahiyan, hîn tevî tevgera rikber û şoreşê nebûne, ji bilî ku, hinek li kêleka rijîmê mane.

- Nezelaliya stratîjîya şoreşê li ser paşeroja Sûriyê, li aliyê din, tevlehevî û aloziya di tektîk û şeweyên xebata gelêrî, yên aştiyane û demokrasî, ya ku berpirsiyariya hemû partî, komîte û encûmenên rikber e.

- Nelihevkerin, keysebazî û berjewendiyên partî û kesayetî, ya di nav beşên rikberiya Sûrî de - bi taybetî di nav yên derve de – yê ku nehiştiye rikbera Sûrî bighêje hev an kongirekî tevahî lidarxe, da ku nûnertiya gel û şoreşê bike, çalakî û livên serhildanê biparêze û pêşxe, û ji rewşa paşerojê re amede be.

- Heyama herêmî û navnetewî nediyare. Dewletên dibêjin piştgiriya şoreşê dikin, wê di ajotina rêbazeke erênî ji çareseriyê siyasî re, bigihên biryar û pêngavên rast, dirust û dilsoz.

- Çekirina şoreşê li hin deveran, hişt ku çavsorî û hovîtiya rijîmê zêde bibe û rewayekê - kêma zêde - bide çareseriyê ewlekarî - leşkerî, rijîm ragihandin û namên xwe ji wê çiroka hebûna (terorîstan) dagire. Di dema ku çekdar nebûne hêzeke xurt û mezin ta karibin li hember leşkerên dewletê bisekinin, yan hin dever û bajaran bidestxin, tê de bi ser kevin .

Mirov dikare bêje, çendî hêzên rikberiya Sûrî li hev bin, li dûrî listik û xefkan bin, li dûrî berjewendiyên taybetî bin, li dûrî cureyên çekdariyê bin, di hundir welêt welêt de girîngiyê bêtir bidin xebata gelêrî, aştiyane û demokrasî, wê di xizmeta gelê Sûrî de be û serkeftina şoreşê wê nêzîktir be. Ji kovara Agirî hejmar 184 hatiye grtin.

**\* Jêder: Rojname Agirî – hejmar /185/**

\*\*\*\*\*

**Dumahîk : Nêrînek ji**

kiriye. Ta ku, ev rûdawa serberdabûna asayî , bûye weke pîrkaboskekê , daye dû hemwelatiyan di pêdiviyên jiyana wan de û bi kûve çûn û hatin. ☐ mînakên tunebûna mazot, gaz û nêna û buhabûna nîrxên tiştan encameke ji encamên wê ye .

Bi navê rêxistina Heleb a partiya Yekîtiya demoqrata kurd li Sûriyê , em dibêjin: na ji hemî wan rûdawên tundûtûjî û serberdayînê re, ji karanîna çekên û bombekirinên deverên xelkên sîvîl lê hene de bigir û ta bûyerên dizîna mirovan û berdêla wan bi peran yan jî kuştina wan bi şewekî tewşankî , û şermezarî ji wan hemî kiryarên kirêt û nemirovane re .

Di vê çarçewê de , em girîng û erk dibînin , ku em bang li hemî berketiyên bajarê Heleb û derdora wê çî kurd çî Ereba , turkman ....û çî misilman û mesîhî li ser paşeroja welatê me Sûriyê û serkeftina şoreşa wê ya aştiyane û pîroz bikin, ku haj xwe bikin û bi van ton kiryarên kirêt û gemarî re neşimitin û nekevin wê dehf û avgira ku jêre tê pilankirin . Ji ber ku ew ton kiryar ziyane dîghînin armancê û nav dengê şoreşê yên pîroz, û di encamp de – bê gûman – xizmet dirêjkirina temenê vê rijîma setemkar û zorker dike.

**Rêxistina Heleb a partiya yekîtiya  
Ya Demoqrata kurd li sûriyê**